# AfD êrîşê me dike û dixwaze biyaniyan hemûyan dersînor bike!

Partiya nijadperest ku bi navê ji bo Almanyayê Alternatîfek - AfD konferansa xwe ya giştî îsal li Essenê plan dike, ku wê di navbera 28 heta bi 30'ê Hezîranê pêk were. Di vê konferansê de partiya nijadperest dixwaze planên xwe yên dersînorkirinê û propagandayên faşîst belav bikin. Li devera ku AfD wê vê konferansê pêk bîne ango li herêma ku bi navê Ruhrgebiet tê naskirin hejmara şêniyên biyanî ji sedî 40 e. Ev yek li hemberî wan kesan îxaneteke mezin e, ku piştî şerê duyemîn ê cîhanê yekser berê xwe dan Almanyayê û ev welêt ji tunebûnê careke din ava kirin.
Afd ku li ser şopa Hîtler dimeşe, dixwaze hişmendiya xwe ya tundrew bi siyasetmedarên netewperest li parlementoyan bi cih bike û bibe desthilatdarekî serdest. Rêxistina bi nave Correctiv li ser vê mijarê lêkolînek pêk anî. Li gorî vê lêkolînê diyar bû, ku AfD yekser dersînorkirina biyaniyan armanc dike ku li Almanyayê dijîn. Dê û bavên me, xwîşk û biryaên me, hevalên me... hwd...
Êdî bes e em rê nadin vê yekê. Ruhrgebiet ew herême ku bi sedhezaran biyanî lê dijîn. Em êdî temaşe nakin û em ê pêşî li êriên li ser civakên xwe bigirin.
Siyaseta heyî ya li Almanyayê û saziyên wê yên têkildar her diçe hîn zêdetir ber bi rastgiriyê ve diçin, hewl didin mafê koçberiyê tine bikin û planên êrişên li ser civakên me dikin.

**Em ê xwe, hebûna xwe û civakên xwe biparêz in.**

Armanca me ew e ku bi AfD nikaribe vê konferansa têkildarî mijarê di nava aramiyê de pêk bîne. Ji bo vê yekê çend çalakî hatine organîzekirin, ku mirov dikare piştigiriyê jê re bike.

**1. Meşên girseyî:**
Em ê tevlî nava meşên girseyî bibin. Bi vî rengî em ê helwestê nîşanî van faşîstan bidin. Ji bo vê yekê divê gelek kes bikevin nava tevgerê û bi rihê seferberiyê tevlî meşên li Essenê bibin.

**2. Çalakiyên sivîl:**
Ji ber ku AfD dixwaze me dersînor bike, têre nake ku mirov tenê li dijî wan bimeşe. Gerek mirov hemû derfetên wan ji destê wan bigire. Ji ber vê jî em dixwazin bi çalakiyen afrîner û rengîn konferansa federal a AfD asteng bikin. Bi vî awayî emê karibin heval û malbatên xwe biparêzin, ku ji ber AfD li bin xeteriye de ne.

**Em wek miroven koçber ên li Almanya, bang dikin:** Em bihevre biherikin kolanan. Ji 7 heta bi 70 salî, ji ciwanan bigire heta bi kal û pîran divê em bi rengê seferberiyê li hev bicivin û biherikin qadên çalakiyên li Essenê.
Dem ew dema ku em bi hev re, mil bi mil li dijî faşîzma ku li Almanyayê bi pêş dikeve têbikoşin û welatekî bi ewle û aram misoger bikin.